

**STRANÊN XWE BI ERMENÎ DINIVÎSÎN****-Stranên xwe bi kîjan zimanî dinivîsîn?**

-Bi Ermenî dinivîsîn. Lê ji bilî kurdî, bi yunanî û erebî jî digot, bi zimanekî pir sade û vekirî. Bi kîjan zimanî jî bigotana, mîna ku ji wî gelî be digot. Kesî nedizanî ku ji netewek din e.

**BI ZIMANÊ DAYIKÊ BI ZAROKÊN XWE RE DIAXIVÎ****-Li nav malê hûn bi hev re bi kîjan zimanî diaxivîn?**

Dê û bavên me tu carî bi zimanekî din bi zarokên xwe re nedixivîn. Digotin: "Bila zimanê xwe yê dayikê hîn bibin. Dema mezin bûn, dikarin zimanên din jî hîn bibin." Ji ber wê jî bi zarokên xwe re bi ermenî diaxivîn. Lê dema dihatin ba hev, bi hev re bi kurdî diaxivîn. Em jî bi ermenî û kurdî diaxivîn. Hemû zarokên me bi kurdî dizanin.

**-Têkiliya Aram Tîgran û civaka Ermen çewa bû?**

-Di komkujiya Împaratoriya Osmanîyan a li dijî ermenan de, Kurdan jî bi nezanî rol lîstin. Osmanî Kurdan bi kar anîn. Lê heman Kurd, jiyana pir malbatên Ermen jî rizgar kirin. Mînak; malbata me jî yek ji van malbatan e. Li gel van hemuyan jî, îroj gelek Ermen nerazîbûn nîşan didin. Em di bawerkirina wan de zahmetî dikşînin. Kurdên wê demê ji bo kesên din dixebitîn. Lê Kurdên îroj, pir cuda ne. Hemdem in û doza aştiya navbera gelên li herêmê dikin. Em di dawî de Ermen in. Lê hin Ermen, ji bo ku em bi kurdan re tevdigerin, me ji derî xwe dihiştin. Lê li gel vê jî, Aram Tîgran timî bû pira biratiyê. Mînak; bawer nedikirin ku dê Kurd ew qasî xwedî li Aram Tîgran derkevin. Îroj gelek ji wan şaş mane. Mîna ku ji kiryarên xwe yê heya niha poşman bûbin. Aram Tîgran, rola xwe ya pira aştiyê, di mirina xwe de jî lîst. Îroj Kurd û Ermen bi hev re ji bo wî hêstiran dibarînin.

**HEYA ROJA MIR JÎ LI GEL KURDAN MEŞIYA****-Aram Tîgran, digot ku dostaniya wî ya bi Kurdan re, wesiyata bavê wî bûye. Hûn dikarin hinek vebêjin?**

-Kurdan malbata me ji komkujiyê rizgar kiribûn. Bavê wî jê re digot: "Tê bibî hunermend û heya mirinê bi Kurdan re bimeşî." Wî jî ev pêk anî. Aram Tîgran hîn 9 salî bû cumbuşê da destê xwe û hîn 17 salî bû, Qamişlo û herêma wê, bi nav û dengê Aram hesiya.

**-Rolek we yê çewa hebû di jiyana hunerî ya Aram Tîgran de?**

-Ev 53 sal in em zewicandî ne. Ez timî pê re bûm. Belê min beste çê nekirin û nota durust nekirin, muzîk lê neda. Hemû jî berhem û keda wî bûn. Lê min timî ew destek kir û rojek jî ew bi tenê nehişt.

**JI BO AMEDÊ XWE HÎNÎ YUNANÎ KIR****-Aram Tîgran di axaftineke xwe de weha gotibû: "Ez ji bo bikaribim biçime Amedê, di vî temenî de fêrî yunanî bûm û bûm hemwelatiyê wan. Min ev hemî ji ber evîna xwe ya Amedê kirin." Ev çewa bû, hûn dikarin hinek vebêjin?**

-4 sal berê em çûne Yunanistanê. Timî weha digot: "Ez divê bibime hemwelatiyê vî welatî. Lewra tenê bi vê riyê dikarim biçime Amedê." Ji ber wê jî pir dixebitî. Bi şev û roj ji bo ziman hîn bibe dixebitî. Van hemuyan, ji bo bikaribe biçê Amedê, kir.

**PIR DI BANDORA WÊ GOVENDÊ DE MABÛ****-Bû hemwelatî û çû Amedê. Hestên wî yê wê kêliyê çi bûn?**

-Cara yekem derket Newrozê. Pir bi kelecana bû. Lewra salên dirêj timî li hemberî Amedê têklyeke wî ya taybet hebû. Dixwest biçê wê derê. Piştî bernameya xwe hat û got: "Ez ê bersiva vê têkildariya mezin çewa bidim?" Min pirs kir; "Çima?", ji min re weha got: "Ez dema li ser dikê bûm, Şaredarê Bajarê Mezin ê Amedê Osman Baydemir, parlamenterên berê yê DEPê Leyla Zana û Xetîb Dicle û gelek siyasetmedarên DTPyî, li ber stranên min govend girtin. Ez dizanim ev kes ne mirovên govendan in. Bi hêsanî li ber stranên her hunermendî ranabine govendê. Ev ji ber rêza wan a ji min re ye. Ez vê yekê pir baş dizanim. Heya dawiya jiyana xwe ez ê vê ji bîr nekim." Pir di bin bandora wê govendê de mabû.

**TÊKILDARIYA MEZIN EW DI NAV 20 ROJAN DE BAŞ KIR-****Dema li Amedê nexweş ket hûn li balê bûn?**

-Dîsa piştî bernameyekê nexweş dikeve. Heval ew radikine nexweşxanê. Doktor jêre dibêjin: "Divê di nav du mehan de tu emeliyat bibî. Eger nebî, em piştî nikarin bi emeliyatê jî te xelas bikin." Ji min re telefon kir û got "Were". Ez jî çûme Amedê. Emeliyat bû. Hemû gelê Amedê bi me re bû. DTPyî, şaredar, hemû li ba me bûn. têkildariyeke pir mezin nîşan dan. Piştî ku Aram Tîgran ii emelivatê derket û cewa D. R ( 8 )